# Kantona Basel-Stadt

Li ser Basel-Stadt
Sazûmana siyasî
Ol (dîn)
Dema vala
Çand

# Li ser Basel-Stadt

Kantona Basel-Stadt yek ji 26 kantonên Swîsreyê ye. Basel-Stadt li ser sêgoşeya Almanya û Fransayê ye û sînorê sê welatan digihîne hev. Aboriyeke xurt û çandeke piralî ya herêmê heye û kalîteya jiyanê bilind e.

## Jimar û danasîn

Basel-Stadt ji sê şaredariyan pêk tê: Şaredariya bajarê Baselê û her du şaredariyên siyasî (Gemeinden) yên Riehen û Bettingenê. Li kantonê derdora 200'000 mirovên ji 160 miletan dijîn. Basel-Stadt xwediyê erdeke 37 km² ye. Kantona herî biçûk a Swîsreyê ye û niştecîyên wê pir zêde ne. Zimanê fermî almanî ye.

## Dîrok

Kantona Basel-Stadt 1833an hatiye damezirandin. Lê belê dîrokeke wê ya dirêj û xweş heye. Di serdema (bikaranîna kevir) paleolîtîka navîn de berî derdora 130'000 salan li vê derê niştewarek hebû. Ji ber ku Basel ciyekî stratejîk bû, Romiyan 30 sal berî zayînê leşkerên xwe li ser girê katedralê bi cî kirine. Li heman cihî îro katedrala Baselê heye. Katedral berê dêreke metranî bû û di sala 1019an de hat pîrozkirin. Ji ber vê yekê li ser nîşaneya kantona Baselê nîşaneke wek gopalekî tê dîtin: Kevaneya gopalê metranî li ser heye.
1460an zanîngeha Baselê hat vekirin. Baselê xwe wek navendeke çapkirina pirtûkan û mirovheziyê bi pêş de bir. Di nîvê sedsala 16an de gelek koçber ji bakurê Îtaliya û Fransayê hatin vê derê. Wan bi xwe re tevn û rengînkirina hevrîşimê anîn Baselê. Şîrketên îro hene yên derman û kîmya bingehên xwe ji vir digirin. 1833an Basel-Stadt û Basel-Landschaft piştî pevçûnên leşkerî ji hev cihê bûn. Îro kantona Basel-Stadt bi giranîdayîna ser zanistên jiyanî, navendeke çand, bazirganî û aboriyê ye.

## Adetên herêmî û kevneşopî

Li kantona Basel-Stadt gelek adetên me yên herêmî û kevneşopî yên ji bo me pir girîng in, hene. Gava hûn bixwazin van kevneşopiyên me hîn bibin, ev ji bo me dilxweşiyek e. Di rêza yekem de Mihrîcan/Qarnaval (Fasnacht) cî digire. Ev her sal sibat an adarê sê rojan tê lidarxistin. Ji ber vê yekê, em wek sê rojên herî xweş «drey scheenschte Dääg» nav lê dikin. Şahiya payîzê ya Baselê (Herbstmesse) ji 500 salî kevintir e û Firoşgeha Noelê (Weihnachtsmarkt) ya Baselê jî xwediyê kevneşopiyeke demdirêj e. Gelek kes di nav_komeleyekê, civatekê yan civakekê de ne. Lîstikên klûba goga lingan a FC Baselê xweş tên temaşekirin û havînê jî gelek kes di ava çemê Rheinê de avjeniyê dikin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/kanton-basel-stadt/li-ser-basel-stadt

# Sazûmana siyasî

Hêza siyasî li Swîsreyê xwe li ser sê beşan parve kiriye: Dewleta Federal, Kanton (yekîneyên welêt) û Şaredarî. Hemwelatiyên Swîsreyî dikarin li ser mijarên siyasî tev li dengdanê bibin.

## Dewleta Federal a Swîsreyê

Dewleta Federal a Swîsreyê di sala 1848an de dameziriye. Paytexta wê Bern e. Li Swîsreyê qalibekî etnîkî, zimanî yan olî tine ye. Çandên cuda bi dildarî gihiştine hev. Ji ber vê mirov wek «neteweke bi vîna gel hatiye sazkirin» (Willensnation) nav lê dike.

## Federalî

Ji ber li Swîsreyê 26 kanton û ji 2000î zêdetir şaredariyên bi awayê siyasî pir serbixwe hene, mirov wek "federalî" nav lê dike. Her kantonek û her şaredariyek xwediyê sazûmana xwe ya dewletî ye. Kantona Basel-Stadt xwediyê zagona xwe ya bingehîn, parlamento û dadgehên xwe ye. Şaredarî û kanton ji gelek karûbarên dewletî berpirsyar in. Ji ber vê yekê wek mînak sazûmana xwendegehan ji kantonekê heta yeke din cuda hatiye sazkirin. Zagonên federalî ji bo giştiya Swîsreyê derbasdar in. Li kêleka wê kanton jî xwediyê zagonên xwe yên tenê li kantonê derbasdar in. Şaredarî jî dikarin rêzgirên xwe saz bikin. Hikûmeta federal, Kanton û şaredarî ji bo karibin karê xwe pêk bînin bacê distînin.

## Cudabûna ji hev a hêzan

Divê hêza siyasî giraniya xwe nede ser hinek kes an saziyan. Ji bo vê hêza dewletî li Swîsreyê û li kantonan li ser sê hêzên serbixwe hatiye parvekirin: Zagonsazî (hêza zagonçêker), Birêvebirî (hêza birêvebirina zagonan), Darezgerî (hêza dadwerî).
Li kantona Basel-Stadt rayedariyên li jêr bi van erkan radibin:

- Zagonsazî: Meclîsa Mezin (Grosser Rat) ( 100 endam, ji aliyê gel ve ji bo çar salan tên hilbijartin)
- Birêvebirî: Desteya Birêvebir (Regierungsrat) ( 7 endam, ji aliyê gel ve ji bo çar salan tên hilbijartin)
- Darezgerî: Dadgehên cihêreng (Gerichte) di asta kantonê de

Li Basel-Stadtê taybetiyek heye: Parlamento, hikûmet û dadgehên kantona Basel-Stadtê bi hev re ji şaredariya bajarê Baselê berpirsyar in. Her du şaredarî Riehen û Bettingen bi xwe jî xwediyê zagonsaziyekê (Legislative) Meclîsa Nişteciyan, (Einwohnnerat) û birêvebiriyekê (Exekutive) Meclîsa Şaredariyê (Gemeninderat) ne.
Di asta federalî de erka zagonsaziyê ji du meclîsan pêk tê: Meclîsa Netewî û Meclîsa Kantonî (Nationalrat und Ständerat) Birêvebiriya Netewî (7 endam) wek Meclîsa Federalî (Bundesrat) tê binavkirin. Di asta netewî de jî dadgehên cihêreng hene. Biryarên dadgehên kantonan dikarin wek mînak, wek rayedariya herî bilind ji aliyê dadgeha federalî ve were nepejirandin (temyîzkirin).

## Mafên demokratîk

Swîsrî dikarin dengên xwe bidin û hilbijêrin. Ew endamên siyasî di asta federalî de û herwiha li şaredariya xwe û li kantona xwe hildibijêrin. Ew dikarin xwe jî ji bo hilbijartinê bikin namzet. Ji bilî van, dengdana gel a li ser karûbarên siyasî jî heye. Li vir hemwelatî dikarin li şaredarî, li kanton û li asta federalî biryarê bidin (demokrasiya rasterast). Hemwelatî dikarin li ser pêşniyarên xwe jî dengdanê bixwazin. Ji bo vê, divê însiyatîfeke gelêrî bidin destpêkirin. Biyaniyên li kantona Basel-Stadt rûdinin, nikarin tev li dengdanê bibin û hilbijêrin. Lê gava daxwazeke wan a siyasî hebe, ew dikarin daxwaznameyekê (Petiton) ragihînin rayedaran. Wekî din, ew dikarin di nav komisyonan, saziyên civakî yan komeleyan de cî bigirin.

## Mafên bingehîn

Di Zagona Bingehîn a Federalî de (Bundesverfassung) prensîbên hiqûqî yên bingehîn ên herî bilind cî digirin. Beşeke herî girîng a Zagona Bingehîn a Federalî mafên bingehîn in, ku xwe dispêrin ser Peymana Mafên Mirovan a Ewropî (EMRK). Ew mafê hebûnî yê mirovan diparêzin, wek mînak, mafê jiyanê, mafê dayîna alîkariya di rewşên tengezar de. Û ew kesan li hember hêza dewletî yan jî komikan li hember piraniyê diparêzin. Divê ew misoger bikin, ku kesên din nikaribin ji ber welatê jê hatiye, nijad, ol, zayend an daxwazên zayendî li rastî cudakariyê werin. Mirovên li rastî cudakariya nijadperestî werin dikarin li Kantona Basel-Stadt bi awayekî belaş alîkarî û şêwirmendiyê bixwazin. Li Swîsreyê azadiya olî, azadiya ramanî û azadiya ragihandinî heye.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/kanton-basel-stadt/politisches-system

# Ol (dîn)

Swîsre welatekî xiristiyan ê kevneşopar e. Lê belê îro li vir gelek mirovên ji oleke din jî rûdinin. Li Swîsreyê azadiya olî heye û xwendegehên dewletê ji aliyê olî ve bêalî ne.

## Ol û dewlet

Swîsre wek kevneşopar di bin bandora ola xiristiyanî de ye. Kanton biryara danûstendina di navbera ol û dewletê de didin. Wek li gelek kantonên almanîaxêv, kantona Basel-Stadt jî hin cîûwarên olî wek saziyên fermî yên rayagiştî dinase. Ev tê wateya, ku dewlet hinek mafên diyar dide wan. Wek mînakeke şênber, ew dikarin ji endamên xwe bacê bistînin. Ev civatên olî yên rayagiştî li kantona Basel-Stadt bi awayekî fermî hatine nasîn: Dêra Reformî ya Evanjelî, Dêra Romî ya Katolîk, Dêra Xiristiyan a Katolîk û her wiha Şaredariya Israîlî (die Israelitische Gemeinde). Hin ciyên din ên civatî ji aliyê kantonê ve hatine nasîn. Ev sazî xwe li gor hiqûqa taybetî birêxistin dikin.

## Civatên olî yên li Kantona Basel-Stadt

Derdora yek ji sê hemwelatiyên Baselî endama/endamê yek ji çar civatên rayagiştî yên bi awayekî fermî û zagonî hatine nasîn in. Li kêleka van gelek civatên din ên olî hene, wek mînak ên îslamî, yên hîndûyî, yên bûdîstî û tevgerên nû. Kêm zêde nîvê nişteciyan ne girêdayî civateke olî ne.

## Azadiya olî

Zagona bingehîn a Swîsreyê azadiya olî hildigire bin ewlehiyê. Ev tê wê wateyê: Her kesek bi xwe dikare biryarê bide, bê baweriya xwe bi kîjan olê bîne. Her kesek dikare baweriya xwe bîne ser zimên û belav bike. Kesek nikare zorê li keseke/kesekî din bike, da tev li civateke olî bibe yan jî tev li danûstendinên olî bibe. Kes dikarin ji bo ayîn û pîrozbahiyên olî bicivin. Mirov nikarin ji ber ola xwe yan baweriya xwe li rastî cudakariyê werin.

## Ol û xwendegeh

Xwendegeha mecbûrî ji warê olî ve bêalî ye. Tevî vê, di dersan de mijarên olî hene. Di asta jêrîn de beşa „Xweza, Mirov, Civak“ heye. Li vê derê awayên jiyanê û çandên cihêreng hene. Bi vê yekê re, hîndekariya olî ya mezhebî ya zarok bi awayekî dildarî dikarin tev lê bibin, heye. Di asta navîn de beşa “Exlaq, Ol, Civak” heye. Tevlêbûna vê beşê mecbûrî ye. Li vê derê, şagirt jêhatiniyên girîng ên ji bo jiyana bi çand, ol, nêrîna li cîhanê û nirxên hewcedariya wan pê heye, hîn dibin. Civatên olî, carinan ji bo zarokên ji baweriyên din derfetên hîndekariyê di demên derveyî xwendegehê de pêşkêş dikin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/kanton-basel-stadt/religion

# Dema vala

Li Basel-Stadt gelek derfetên balkêş ên derbaskirina dema vala hene. Bi taybetî komele girîng in. Hûn dikarin li vê derê mirovên nû nas bikin û bi hev re hin tiştan bikin.

## Komele

Gelek niştecîyên Baselê endamên komeleyekê (Verein) ne. Komeleyên ji bo baldariyên cihêreng hene, wek mînak, komeleyên werzişî û komeleyên çandî. Gava hûn beşdarî komeleyekê bibin, hûn dikarin mirovên din nas bikin. Piraniya komeleyan ji hemû kesî re vekirî ne.

## Derfetên ji bo ciwanan

Ciwan dikarin di demên xwe yên vala de gelek derfetên nasîna ciwanên hevtemenê xwe bi kar bînin. Ew dikarin di nav projeyekê de bi hev re bixebitin û ramanên xwe pêşkêş bikin. Kesên pispor alîkarî û piştgiriya ciwanan dikin (Jugendarbeit). Ev derfet bi gelemperî belaş in.

## Geryan û çand

Hûn dikarin li kantona Basel-Stadt gelek geryanan bikin û biçin serdana çalakiyên çandî. Gelek mirov havînê di ava Rheinê de avjeniyê dikin an jî li seyrangehan seyranê dikin. Malbat hez dikin biçin baxçeyê ajalan ê Baselê. Li hawîrdorê gelek riyên xweş ên ger û birêveçûnê û ajotina duçerxeyan hene. Hûn dikarin xwe bi trênê bi lez bigihînin bajarên wek Freiburga li Breisgau an jî Strasburgê. Hûn dikarin ji Basel Tourismus agahiyên, bê kîjan geryanan bikin û dikarin tev li kîjan çalakiyan bibin, bistînin.

## Ciyên hevdîtinê yên taxan

Ciyên hevdîtinê yên taxan (Quartiertreffpunkte) ji bo hemû mirovan vekirî ne. Derfetên ji bo malbatan, ji bo kalûpîran û ji bo mirovên kêm bi almanî diaxivin, hene. Hinek ciyên hevdîtinê navendên ji bo malbatan in. Li vê derê hevdîtina vekirî ji bo dê û bavên xwedîzarok heye. Ciyên hevdîtinê yên taxan di jiyana rojane de şêwirmendî û alîkariya we dikin. Hûn dikarin li ciyên hevdîtinê yên taxan ji bo şahiyên malbatî û pîrozbahiyên din odeyan kirê bikin.

## Kar û xebata dildarî

Hûn bi kar û xebata dildarî (Freiwilligenarbeit) alîkariya mirovên din û jîngehê dikin. «Dildarî» tê wateya, ku hûn ji bo wê pere nastînin. Li Swîsreyê gelek karûbar bi taybetî li komeleyan bi dildarî tên kirin. Gelo karê dildarî bala we dikişîne? Hûn dikarin xwe li komeleyekê ji bo gelek mijaran pêşniyar bikin, wek mînak ji bo çand, werziş, çalakiyên civakî, xwendin, parastina ajalan, parastina jîngehê yan jî tenduristî.
Hûn dikarin li vir agahiyên ji bo xebatên dildarî û tevlêbûnê bistînin:

- Ciyê pisporî yê ji bo karê dildarî GGG Benevol
- Xaça Sor a Swîsreyî ya Basel-Stadt (SRK)
- Karîtas (Caritas) a her du Baselan

Agahiyên tevlêbûnê yên qada penaberî û koçberiyê:

- Ciyê koordinasyonê yê ji bo karê dildarî li qada penaberiyê (KOFF)
- Alîkariya penaberî ya Swîsreyî

## Erzankirinên di çalakiyên werziş, çand û perwerdeyê de

Nasnameya “KulturLegi” ji bo mirovên kêmpere ye. Gava KulturLegi ya we hebe, hûn ji bo çalakiyên di qada werziş, çand û perwerdeyê de hindik pere didin. Hûn dikarin KulturLegi li ba Karîtasê (Caritas) bidin çêkirin. Karîtas li ser vê agahiyê dide we û lê dinêre bê hûn dikarin KulturLegî bistînin. Ji bilî vê Karta Malbatî (Famillienpass) û Karta Malbatî-zêdetir (FamilienpassPlus) heye. Ev her du kart (pass) ji bo malbatên li Bakurrojavayê Swîsreyê rûdinin tên dayîn. Ji bo zarok, ciwan û gihiştiyên ciwan gelek erzaniyên din û derfetên belaş jî hene, wek mînak «miftereng» (colourkey) an jî karta bînvedanê (Ferienpass). Bi KulturLegi, Familienpass an jî colourkey gelek derfetên erzantir hene. Hûn dikarin agahiyên zêdetir li ser internetê bibînin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/kanton-basel-stadt/freizeit

# Çand

Li Basel-Stadtê gelek çalakiyên çandî hene. Gava gelek pereyê we tine be, gelek derfetên cihêreng ên bi awayekî belaş an erzantir tev li çalakiyan bibin û wan bi kar bînin, hene.

## Muze / Pêşangeh

Nêzî çel muze, pêşangeh û çalakiyan pêşkêş dikin. Ji bilî van, hûn dikarin biçin serdana galeriyên biçûk û odeyên hunerî. Li gelek ciyên vekirî berhemên hunerî yên kifşkirinê hene.

## Muzîk / Reqs / Şano / Wêje

Li kantona Basel-Stadt gelek çalakiyên çandî hene. Hûn dikarin li Theater Basel çêja opera, drama û baletê, li Kaserne jî ya muzîka hemdem, reqs an şanoyê bistînin. Ciyên biçûktir ên wek Vorstadttheater an Sommercasino jî hene. Hûn dikarin di havînê de serdana gelek pêşandan û mihrîcan (festîval) ên li derve bikin. Hinek çalakî belaş in.

## Avahîsazî

Hûn dikarin li Basel û derdora wê gelek avahîsaziyên nûjen kifş bikin. Wek mînak li Riehenê Fondation Beyeler a avahîsaz Renzo Piano heye. Li navenda bajarê Baselê avayiya nû ya Kunstmuseum Basel ji aliyê Christ & Gantenbein ve, yan berfirehkirina Stadtcasino Basel ji aliyê Herzog & de Meuron ve, hene.

## Piştgiriya xebatên çandî

Ger pîşeyê we huermendî be, hun dikarin ji bo projeyên xwe daxwaza pereyan bikin. Hûn dikarin li ser malpera Beşa Çandî agahiyên wek mînak, bê hûn çawa dikarin serlêdana alavên alîkariyê bikin, bibînin.

## Derfetên belaş û erzankirî

Gelek muze û ciyên çalakiyan, derfetên taybetî pêşkêş dikin. Wê demê wek mînak, hûn pereyê derbasbûna hundir ji bo hin demên diyar kêmtir didin an qet nadin. Ji bo hin kesên diyar, derbasbûna hundir piranî erzantir an belaş e. Ji bilî van jî li ciyên vekirî pêşangehên belaş an festîval hene. Gelek komele (Vereine) û rêxistinên qada penaberiyê derfeteke çandî pêşkêş dikin. Bi KulturLegi, karta malbatî (Familienpass) an jî colourkey gelek derfetên erzantir hene. Hûn dixwazin bi tena xwe neçin muzeyan an jî çalakiyên din? Gelek derfetên ji bo bihevreçûna bi awayê kom an cot (Tandem) heye. Wateya «Tandem»ê: Hûn bi keseke/kesekî din re, bi hev re tev li çalakiyan dibin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/kanton-basel-stadt/cand